Tayek porê sipî

(Li ser şopa Menfelotî)

Ji kovara Ronahî . Hejmar 131 ê Nîsana 1943 an **Qedrî Can**

Îro, sibehê di ber yanê re derbas dibûm. Min, di nav porê serê xwe de tayekî sipî dît.. Mîna birûska nav şeva tarî, diçirisî…

Gava çavê min pê ket, veciniqîm; mîna ko, ji nişkave, şûrek li serê min keve.. Nola ko yek ji ezmên dakeve, û di destê wî de aleke spî hebe û mizgîna mirinê bide min.. Min fam kir ko, derdekî bî derman e, yan jî tayek ji tayê kefen e...

Ey tayê spî! Min tu rengê spî mîna gewrbûna te reş ...Û tu nûr, qandî nûra te tarî ne dît...Te, her tiştê spî li pîrbûnê…Ey tayê spî! Ez, dibînim ko tu xwedî dek û rip î; tu, hêdîka, di guhê cîranê xwe de dikî ((kur û pis)) û tu, wan dixapînî, ko ew jî mîna te bibin. û cilên ko te li xwe kiriye ew jî li xwe bikin… Tu dixwazî di nav vî diyarê bê deng û bê gir-gêc de, ceng û cidalekê çêbikî.. da ko herkes di bin lingan de biperçiqe… Tu, mîna însanê spî dikevî nav welatê reşikan û wan dixapînî û tu wan rebenan ji xwe re dikî kole û bende…

Ey tayê spî! Tu kî yî, tu çi yî , kê tu şandiye û karê te li ba min çi ye?? Heke tu mêvanî, kanî izin û destûra ko min daye te? Heke tu bi hevalî hatiyî cem min, ez wî hevalê ko min bi xwe re bibe gorinê naxwazim… ber çavê min reş kir; heta ronahiya hêv û tavê…heta roniya her du çavan… Û te, her tiştê reş jî li ber çavê min spî kir; heta qijika reş..heta bext û dilê reş…

Ey tayê spî! Te, xwe di kîjan pencerê re avête ser serê min û te, di kîjan rê re xwe gihande cênîka min?! Tu çawan di vê zeviya reş û tarî de, tek û tenha, bê heval û hogir karî bimînî? Qet çavê te ji vê tariya reş natirse?!

Ey tayê spî! Ez nizanim xwe çawan ji te xelas bikim û çawan ji te birevim!!. Tu fêdeya wê ji min re nine ko ez te ji cihê te bikişînim yan jî te boyax bikim.. Ez naxwazim ko di nav du misîbetan de bimînim: misîbeta derewan û misîbeta Xwedê zane tu mîna wan maran î ko hêlînê her tebayî kuna xwe dizanin.

Ey tayê spî! Min pir ji te gilî û gazin kirin, lê ez dibînim ko ez ne rast im; dîsa tu ji her tiştî, ji her kesî bêtir li ba min bi rûmet, li ber çavê min bi qedr dimînî..Serê min ji te re zozan û pîroz be.. tu ji xwe re –mîna dixwazî-tê de vegevize.

Ez dizanim tu, rêberê mirinê yî, rêberê wê reyê yî ko tu rê lê nabe.. Çima ruyê xwe ji te tirş bikim? Min ji xortaniya xwe tu xêr ne dît ko ji pîr-bûna xwe bitirsim.. Min şêraniya dinê tam nekir ko talbûna axretê madê min tirş bike...

Wey li ser seran û li ser çavan hatî, ey tayê spî!..

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de